

hejmar 50 - Havîn 2012

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pîrsên zaravayê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)Civîna
Ehmedê Xanî li Bazîdê

Civîna Kurmancî ya vê carê, rojên di navbera 30.06.12 – 7.07.12an de, li Bazîdê û di bin navê edîb û filozofê mezin yê neteweyê kurd Ehmedê Xanî de hat li dar xistin.

Ehmedê Xanî salên di navbera 1651 - 1707an de jîyaye. Wî, li cîhanê, berî peydabûn û belavbûna fikr û ramana neteweyî, ji bo avakirina dewleteke neteweyî, xwast ku kurdan di vî warî de hişyar bike. Rêyeke rast ji bo parastina hejahiyyên xwe yê neteweyî û avakirina welatekî yekbûyî, di bin alayekê de û serbixwe, ji parçebûna eşîrtîyê dûr, bide ber wan. Ji lewra digot:

Ger dê hebûwa me ittifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek

Rûm û 'ereb û 'ecem temamî
Hemiyan ji me ra dikir xulamî

Tekmûl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me 'ilm û hikmet

Temîz-i dibûn ji hev meqalat
Mumtaz-i dibûn xwedankemalat

Lê mixabin e, ku kesî guh neda şîretên wî. Beg, mîr, se-rekeşîr, axa û giregirên civata kurdan, desthilatdarên kurdan yên wê serdemê, ji van daxwazan re biyanî bûn, xwe nêzikî van bîr û hizran nedikirin. Wan emir-berîya biyaniyan, girêdanên xulamî û koletîyê di ser van daxwazan re didît. Ketibûn korerêyekê û encamên dahatîya xwe, yên qûl û qewmên xwe, yên zarokên gelê xwe yê kurd nedidîtin. Guh jî nedidan aqilmen-dên wek Ehmedê Xanî. Ji ber vê yekê, bang û dengê wî dibû wek bilûra ber guhê kerr.

Pîştî çend sedsalên din, gava ku Kurdistan bû çend perçe, kurd hatin tarûmar kirin, puxtêya banga wî hêdî hêdî hat fehm kirin. Lê, qareqar û barebar êdî bê feyde bû.

Belê, niha em li şasiyên xwe werqilîn, me dît ku em çawan ketine rêyeke şaş û bêoxir...

Ji bo bilindnirxandina vê bang û dengê Ehmedê Xanî, edîbê xwedantaca zêrîn, Mem û Zîna şahesera neteweyê kurd, bavê kurdperwerîyê, me navê wî li civîna 50yî ya Kurmancî kir. Me di bin navê wî de û li bajarê ku wî xizmet dayê, li wir ku bi zanistê ve mijûl bûye û serê xwe lê daniye ser axa sar, civîna Ehmedê Xanî ya Kurmancî pêk anî.

Di civînê de li ser van babetan hat kar kirin:

Masî û masîvanî, gulûgiya – mêwe – hêşînahî –, pezxwedîkirin, termînolojiya pizîşkî û heşare.

Ev hevalên han beşdarî civînê bûn: Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Rojen Barnas (Diyarbakir), Omîdê Mistefayê Celalî (Bazîd), Lezgînê Çalî (Barzan), Ehmedê Dirîhî (Çewlik), Elîşêr (Wan), Xalidê Hekarî (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Eyûb Kiran (Qerejdax), Selam Nûman (Qamişlo), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî).

Em berhemên ji vê civînê li jêrê pêşkêş dikin.

Termên zimannasîyê

Amadekar: Mistefa AYDOĞAN
Newzad HIRORÎ

Têbînî: Ev babet berhema civîna 49an e û divîya di wê hejmara Kurmancî de bihata weşandin. Lê çi heyf ku di rûpelên wê de cih nemabû û em neçar man ku di vê hejmarê de biweşînin. Bila kedkarên wê li me negirin û xwendevanên me jî li me biborin..


kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
bî hev ve kirin	bitişmek	agglutiner, se joindre, se lier	agglutinate
bihevvekirî	bitişimli, eklemeli	agglutinant, agglutinatif	agglutinative
bihevvekirin	bitişim, bitişme	agglutination, liaison	agglutination
düziman	ikidilli	bilingue	bilingual
düzimanî	ikidillilik	bilinguisme	bilingualism
düzimanîya kesane	bireysel ikidillilik	bilinguisme individuel	individual bilingualism
düzimanîya tam	tam ikidillilik, ideal ikidillilik, dengeli ikidillilik	bilinguisme total	full bilingualism
malbata zimanan	dil ailesi	famille de langues	family of languages
şifreguhartin	dil değiştirimi	alternance de codes	code switching, language switching
yekziman	tekdiilli	monolingue	monolingual, monoglot
yekzimanî	tekdiillilik	monolinguisme	monolingualism
zaravanas	lehçebilimci	dialectologue	dialectologist
zaravanasî	lehçebilim	dialectologie	dialectology
zaravayî	lehçesel	dialectal	dialectal
zarê demê	dönemsel dil	chronolecte	chronolect
zarê demî	dönemsel dile değin	chronolectal	chronolectal
zarê deverî	yöresel ağız	géolecte	geolect
zarê etnikî	ethnolect	ethnolecte	ethnolect
zarê kesane	birey dil	idiolecte	idiolect
zarê zayendê	cinsiyet dili	sexolecte	genderlect, sexolect
zarê zayendî	cinsiyet dile değin	sexolectal	genderlectal, sexolectal
zimanê berxeter	tehlikedeki dil	langue en danger	endangered language
zimanê biyanî	yabancı dil	langue étrangère	foreign language
zimanê çêkirî	yapay dil, yapma dil	langue artificielle	artificial language
zimanê efsûnê	büyük dili	glossalalie	glossalalia
zimanê nebingehîn	ikincil dil	langue seconde	embedded language
zimanê rojane	gündelik dil, günlük dil	discours familier, langage quotidien	colloquial speech
zimanê zarokan	çocuk dili	langage enfantin	child language, infant speech
zimanê zayendnêtar	cinsiyet yansız dil	langue à genre neutre	gender-neutral language
zimanên bêzayend	cinsiyetsiz diller (dilbilgisel olarak)	langues sans genre	genderless languages
zimanên bihevvekirî	bitişimli diller, eklemeli diller	langues agglutinantes	agglutinative languages
zimanên bireserî	belirtme(li) diller, akuzatif diller	langues accusatives	accusative languages
zimanên ergatîv	özegeçişli diller	langues ergatives	ergative languages
zimanên hevreh	akraba diller	langues apparentées	cognate languages
zimanên jihevvekirî	çözümleyici diller, yalınlayan diller, ayrışkan diller	langues analytiques, langues isolantes	analytic languages, isolating languages
zimanên kreol	kırma anadili	langues créoles	creole languages

zimanên lebati	etken diller	langues actives	active languages
zimanên mirî	ölü diller	langues mortes	dead languages
zimanên neqalibdar	oynak dizilişli diller	langues non configurationnelles, langues flexionnelles	non-configurational languages, flexible languages
zimanên qalibdar	kalıplı diller, katı dizilişli diller	langues configurationnelles	configurational languages, inflexible languages
zimanên tewangbar	bükümlü diller, bükünlü diller	langues flexionnelles	[in] flectional languages, fusional languages, inflecting languages, flexional languages
zimanên tikitikî	şaklamalı diller	langues à clic	click languages


Dar - Arbre - Tree

Amadekar: Ehmedê DIRIHÎ

kurdî	latînî	tirkî	fransizî	ingilîzî
asindar, hesindar, dêdar, dildar, dîndar, gelberû	<i>quercus Libani (regia)</i>	Lûbnan meşesi	chêne du Liban	Lebanon oak
lûxpêre, xulpêre	<i>quercus petraea pinnatiloba</i>	sapsız meşe	chêne rouvre, chêne sessile	sessile oak
tepedor, dara tepedorî	<i>quercus suber</i>	mantar meşesi	chêne-liège	cork oak
şabî	<i>salix aegyptica</i>	mısır söğüdü	saule égyptien	egyptian willow
bîya qufikan, duberxik, germajo	<i>salix caprea</i>	keçi söğüdü	saule marsault, saule des chèvres	goat willow
reşebî	<i>salix nigra</i>	kara söğüt	saule noir	black willow
ajik, behîva tehl, qijbehîv, behîva kovî (bejî)	<i>amygdalis amara</i>	acı badem	amandier amère	bitter almond tree
bizmik	<i>amygdalis amara</i>	alıç	aubépine	hawthorn
dara tirşe	<i>oxydendron</i>			sourwood
sêvetirşk, sêvtirşk	<i>malus silvestris</i>	bir tür yabani elma	boquettier, pommier sauvage ou pommier des bois	crab apple
nermedar	<i>periploca graeca</i>	yunan ipekotu	périploque grecque	silk vine
zan	<i>fagus sylvatica</i>	avrupa kayını	hêtre commun	european beech
Mêwe		Meyve ağacı	Arbre fruitier	Fruit tree
şilor	<i>prunus domestica</i>	mürdüm eriği	prunier	common plum tree
salor, dembûl	<i>prunus laurocerasus</i>	kara erik	laurier-cerise	cherry laurel
godîş	<i>crataegus tanacetifolia</i>	ayva alıcı, sarı alıç	épines d'orient	tansy-leaved thorn
muşmule	<i>mespilus germanica</i>	muşmula, döngel, beşbiyık	néflier d'Allemagne	medlar tree
yengîdunya, êngîdunya	<i>eriobotrya japonica</i>	yenidünya, malta eriği	néflier du Japon	loquat
Gulûgîya û hêşinahî				
kitmînk	<i>raphanus raphanistrum</i>	yabani turp	radis ravenelle	wild radish
bacik, çoxik	<i>capsicum annuum</i>	biber	piment	capsicum
meymesk	<i>aethusa cynapium</i>	it kişnişi, yabani maydanoz	petite ciguë, faux-persil	fool's parsley
qicî	<i>cardaria draba</i>	keci otu, yabani tere	passerage drave, pain blanc	whitetop
zuxal	<i>cornus</i>	kızılçık sopası, kızıl çubuk	cornouiller	cornel, cornelian cherry
gîyareng, çirix	<i>datisca cannabina</i>	renk otu	chanvre vivace	false hemp
kulindok	<i>mandragora officinarium</i>	adamotu	mandragore	mandrake
hevîzar, belghewêz, belga birînan	<i>plantago lanceolata</i>	sinirotu	plantain lancéolé	ribwort plantain
tûsî	<i>eryngium billardieri f.</i>	eşek dikenî	variété de chardon	common name: eryngo
agirok	<i>ranunculus ficaria</i>	basur otu, düğün çiçeği	ficaire fausse-renoncule	lesser celandine
gileso, gilîso, so	<i>heracleum trachyloma</i>	tavşancıl otu	berce	common name: hogweed
kuvarkên helizê	<i>pleurotus eryngii ferulae</i>	kayın mantarı	pleurote de la fêrule	king trumpet mushroom
tîjtîjok	<i>ornithogalum narbonense</i>	akbaldır	ornithogale de Narbonne	Narbonne star-of-Bethlehem
xîyarok	<i>capparis spinosa herbaceae</i>	kebere	câprier commun	common name: caper
zîwan	<i>cephalaria procera</i>	yüksek pelemir	scabieuse	cephalaria
dîneb, dimor, dimol, zîwan	<i>lolium temulentum</i>	delice	ivraie enivrante	darnel
birakardî	<i>calla palustris</i>	bataklık nergisi	arum des marais	calla
cehnem-behişt, zirbeybûn, kulîlkmast	<i>anthemis arvensis</i>	köpek papatyası	anthémis des champs	corn chamomile
çîlkêsan	<i>leucojum vernum</i>	gölsoğanı	nièvre d'été	summer snowflake



Asindar, hesindar, dêdar, dildar, dîndar, gelberû
Quercus libani (regia)



Lûxpêre, xulpêre
Quercus petraea pinnatiloba



Tepedor, dara tepedorî
Quercus suber



Şabî
Salix aegyptica



Bîya qufikan, duberxik, germajo
Salix caprea



Reşebî
Salix nigra



Ajik, behîva tehl, qijbehîv, behîva kovî (bejî)
Amygdalis amara



Dara tirşe
Oxydendron




Sêvetirşk, sêvtirşk
Malus silvestris



Nermedar
Periploca graeca



Zan
Fagus sylvatica



Salor, dembûl
Prunus laurocerasus



Şilor
Prunus domestica



Godîş
Crataegus tanacetifolia



Muşmule
Mespilus germanica



Yengîdunya, êngîdunya
Eriobotrya japonica



Kitmînk
Raphanus raphanistrum



Bacik, çoxik
Capsicum annuum



Meymesk
Aethusa cynapium



Qici
Cardaria draba



Zuxal
Cornus



Giyareng, çirix
Datisca cannabina



Kulindok
Mandragora officinarum



Hevîzar, belghewêz, belga birînan
Plantago lanceolata



Tûsî
Eryngium billardieri f.



Agîrok
Ranunculus ficaria



Gilesî, gilîso, so
Heracleum trachyloma



Kuvarkên helizê
Pleurotus eryngii ferulae



Tijîjok
Ornithogalum narbonense



Lûxpêre, xulpêre
Quercus petraea pinnatiloba



Xîyarok
Capparis spinosa herbaceae




Ziwan
Cephalaria procera



Dinêb, dimor, dimol, zîwan
Lolium temulentum



Bîrakardî
Calla palustris



Cehnem-behîst,
zirbeybûn, kulîkmast
Anthemis arvensis



Çîlkêsan
Leucojum vernum

Heşare - Heşere - Insecte - Insect

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

Têbînî:

Di civîna Kurmancî de li ser peyva *heşare* gotûbêjeke pir dîrûdirêj hate kirin. Di nav gencîneya peyvên kurdî de hîç peyvek nehat dîtin ku tam bergindê heşareyê be. Di zimanê ewropî de jê re *insect* / *insekt* tête gotin ku ji peyva *insectum*-a latînî hatiye. Di hemû zimanên rojhilatî de jê re heşare / haşere / haşerat dibêjin ku ji zimanê erebî ye.

Peyvên kurdî yên wek; bihuk / buhuk, marûmûr, mêşûmoz, kêzûmêz, kurm / kirm û hwd, her yek ji van ji bo mebesteke taybetî ye û maneya heşareyê nadin. Peyva heşareyê di nav hemû kurdan û zaravayên kurdî de heye û tête bi kar anîn. Nedibû em peyvekê daynin ku ji maneya ku em dixwazin gelekî durtir be û di zimanê me de bibe sedemên sergêjîyekê. Ji ber vê me çêtir dît ku em peyva heşareyê bi kar bînin.


kurdî	latînî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
heşare	<i>insectum</i>	haşaret	insecte	insect
Kêzik	<i>Coleoptera</i>	Böcekler	Coléoptères	Beetle
kêzika gû, kêzika rêxê, buluca rêxê	<i>scarabaeus sacer</i>	bokböceği	bousier	dung beetle
kêzika reş	<i>carabus</i>	karafatma	carabus	carabus
kêzika fisek	<i>brachinus crepitans</i>	osurgan böceği	bombardier commun	stink beetle, bombardier beetle
Mêş û moz		Sinek ve arılar	Mouches et abeilles	Flies and bees
mozqirt, zirqit, mozqirtik, moza zer, mozezer, zirqîçk	<i>mellinus arvensis</i>	sarıca, yaban arısı	melline des champs	field digger wasp
kermoz, moza sor, mozebeş, stêng	<i>vespa crabro</i>	eşek arısı	frelon européen	hornet
mêşa hespan	<i>hippobosca equina</i>	at sineği	taon	horset fly, gad fly
mîrmîrk	<i>simulium spp</i>	üvez sineği	phlébotome	buffalo gnat
qûnteşî, serteşî	<i>odonata</i>	yusufçuk	libellule	dragonfly
hespikê nebiya, hespê bûkê, hespê gîhê, hespê Fatma nebî	<i>mantis religiosa</i>	peygamber devesi	<i>mante religieuse</i>	praying Mantis
pîndîk	<i>argas persicus</i>	kümes kenesi	tique de vollail	fowl tick
qîrnî, qijnik, tepî, gijînî, gene, kene	<i>ixodes ricinus</i>	kene	tique	tick
hezarpê, çîlpê, pîrpêtk, zîvê duser, jarmar, şarmar, bijmar, zof	<i>scolopendra morsitans centipede</i>	kırkayak	scolopendre	centipede
masîyên keran, kermasî		iribaş, kurbağa yavrusu	têtard	tadpole



Kêzika gû, kêzika rêxê, buluca rêxê
Scarabaeus sacer



Kêzika reş
Carabus



Kêzika fisek
Brachinus crepitans



Mozqirt, zirqit, mozqirtik,
moza zer, mozezer, zirqîçk
Mellinus arvensis




Kermoz, moza sor, mozebeş,
stêng
Vespa crabro



Mêşa hespan,
Hippobosca equina



Mîrmîrk
Simulium spp



Qûnteşî, serteşî
Odonata



Hespikê nebiya, hespê bûkê,
hespê gîhê, hespê Fatma nebî
Mantis religiosa



Pîndîk
Argas persicus



Qîrnî, qijnik, tepî, gijînî, gene, kene
Ixodes ricinus



Hezarpê, çîlpê, pîrpêtk, zîvê
duser, jarmar, şarmar, bijmar, zof
Scolopendra morsitans centipede



Masîyên keran, kermasî

Masî û masîvanî

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

Destpêk

Li gora xebateke zanistî di 2009an de li bakurê Kurdîstanê 50 kooperatîfên masîvaniyê hene. 1.586 masîvan endamên van kooperatîfan in. Di vê xebatê de 654 keştiyên masiyan hatine tesbît kirin.

Encama nêçîrê 6.355 ton/ salê, dirêjahiya torên masiyan 1.029.000 m û 21.000 heb torên pînteran hatine tesbît kirin.

Bêyî van, 309 masîvanên bi serê xwe û 209 keştiyên masiyan bi hev re nêzikî 7.824 ton/ salê masî girtine.

Li gora van xebatan hilberîna masiyên avên hundurîn ên Kurdistanê Bakur bi qasî nivê yên Tirkîyê ye.

Ji van em fam dikin ku masîvaniya Kurdistanê Bakur gelekî muhîm e. Dewleta Tirkîyê neçîra masiyan bi qanûnê ve girê daye û kontrol dike. Li gora qanûnê mehên nîsan, gulan, hezîran, tîrmeh û tebaxê neçîra masiyan qedexe ye. Bêyî van mehan rojên musafîd neçîra masiyan dikare bê kirin.

Masiyên Gola Wanê dikarin tenê 60 rojên zivistanê bîn girtin. Şiklê neçîrê: masîgir torên xwe serê sibê diavêjin û êvarê berhev dikin, yan jî êvarê diavêjin û serê sibê berhev dikin. Masîgir torên xwe diavêjin kûrahiyê û ber bi qiraxan dikşînin.

Masiyên Mala Badê

- Şelq (Şerq): Masiyan dixwin, dirêj in, goştê wan xweş e.
- Şimşûl: Zirav û dirêj in, serê wan biçûk in, goştê wan ne bi kêr in. Mezinê wan bi qasî du bihostan mezin dibin. Havînê goştê wan bi mirov tahl têt.
- Kerkerok: reş in, biçûk in (bihostek), donê wan pir e, goştê wan nayê xwarin, wexta mirov dibînin xwe bi tahtan ve dizeliqînin.

Neçîra beraviyên çemê Batmanê

Zivistanê di çeman û golên pir kûr de, qefikê tahtan cîhê kombûna wan e. Taht tune bin ew erdê vedidin di nav av, qûm û heriyê de ji xwe re qulikan çêdikin û dikevinê. Di wan qulan de bi destan têt girtin. Di girtîna de hostafî lazîm e. Masiyên qulan celebê bi cîsn in, rind in. Di neçîra masiyan de koça masiyan têt şopandin. Têt zanin ku kînga koç dikin û ebûrê wan kînga têt. Masiyên bi cîsn di serê biharê de ber bi hevraz diçin. Xwe li ava berfê digrin. Çûyina dema her celebî cûda ye.

Biharê bi misasan nêçîra wan dibe. Misas alîyek zixt e, alîyek labût e. Aliyê labûtê didin çerxê, mîna devê şûran tûj dikin. Neçîrvan bi misasên xwe dikevin nav avê, buhurên tenik û ji jor de bera ser masî didin. Neçîrvanên hoste bi vî awayî gelek masî digirin.

Payiza dereng jî berjêr diçin. Ew jî wek keriyê kûviyan, wek refê çûçikan qefle bi qefle berjêr dibin.

Şevên payizê bi sûkan diçin neçîrê. Guliyê dara meşeyan li ber devê şonikan ta bi ta vediçîrînin. Veçîrandin û bi şûn de eger mirov agir pêxe êdî venamire. Bi sûk û misasan diçin neçîra masiyan. Wexta masî ronahiya sûkan dibînin, dirikinin (*Rikinan-dîn: li cîhê xwe sekinîn*).

Bi tora ser darika neçîra masiyan:

Destikeke mîna misasa serê wê çardar û dora wê bi dareke mîna gopal badayî ve tor têt gîredan û bi vê torê li cîhên ava şolî masî tèn girtin.

Bi pîjan neçîra masiyan:

Pîj mîna tîreke qalind e, di serî de bizmarên vaca û dawiya pîj bi benekî zexm ve girêdayî ye. Li ser buhura wexta masî tèn dîtin, pîj têt avêtin, serê pîj di masî de dihere hundur û bizmarên vaca asê dikin, mirov benê pîj bi şûn de dikişîne, masî jî pê re têt.

Bi torên mezin neçîra masîyan:

Heskîfî li ser kelekan û bi torên mezin masiyan digirin, di dema kevn de ji Heskîfê he-tanî Mûsilê masî dihatin girtin û dibirin difrotin.

Bi sepetan (selêkan) jî masî tène girtin.

Masîvanî	balıkcılık	fish farming	pêcherie, pisciculture
Masîvan	balık üreticisi, balıkçı	pisciculturist	pisciculteur
Masîgir	balık tutan, balıkçı	fisher, fisherman	pêcheur
Masîgirî	balıkavlama, balıkavcılığı	fishing	pêche

Di çem, gol, golên piçûk, bendav û bêrmên avê yên Kurdîstanê Bakur de hinek celebên masiyan:

kurdî	latînî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
beneksor: li wîlayeta Wanê navçeya şaxê di çemê Kanîspîyê de nû hatiye dîtin	<i>salmo tigridis</i>	alabalık	truite du Tigre	Tigris trout
deqsor, masîxatûnk, sorbelek: li ser kêleka wî 10-12 deqên sor hene	<i>salmo trutta macrostigma</i>	alabalık	truite à grosses taches rouges, truite saumonée	brown trout
masîgur: di çemê Dicleyê û hemû şaxên wê de hene	<i>aspius vorax</i>	sis balığı (kocaağız)	aspe	asp
terîx: masiyê gola Wanê	<i>alburnus tarichi</i>	inci kefali	darekh	tarek
şînok	<i>alburnus mossulensis</i>	Musul kolyozu (inci) balığı	ablette de la région de Mossoul et d'Anatolie	bleak
şebot, şabot, şebût : çemê Dicle û hemû şaxên wê de hene	<i>barbus lacerta</i>	biyıklı balık	barbeau	barbel
sîrînk : sering, siring, sêlêv. Siring masiyekî bi cîsn e, gelekî mezin dibin. Ew berê dibin cewr, paşê dibin masiyê mezin. Pelikên wan mezin in, goştê wan zaf xweş e	<i>luciobarbus capito</i>	kocabaş biyıklı balığı	variété de gros barbeau à la chair savoureuse	bulatmai barbel
cer, cero: masiyê çemê Dicleyê ye, di nav celebên masiyan de yê herî mezin dibin e.	<i>luciobarbus esocinus / luciobarbus xantopterus</i>	biyıklı turna balığı maya balığı	mangar brochet à barbillons	mangar barbel needle fish
zereke, zerdemasî, pîrpas (Mala Badê), sîraz: masiyê gola Xezerê, Dicle, Xînûs û besta Kilîs û Tercanê ye.	<i>capoeta capoeta umbla</i>	Dicle sarı balığı	variété de poisson d'eau douce qu'on trouve dans le bassin du Tigre et de l'Euphrate	fresh water fish found in the Tigris and the Euphrates
berat, çepîç: di çemê Dicleyê û hemû şaxên wê de hene	<i>capoeta trutta</i>	bir tür Dicle alabalığı	variété de poisson d'eau douce qu'on trouve dans le bassin du Tigre et de l'Euphrate.	fresh water fish found in the Tigris and the Euphrates
şebotê bersor (soreke) : reng sore ye û masiyekî mezin e, berê dibin cewr. Di çemê Dicleyê û ava Botan de hene	<i>barbus(tor) grypus</i>	şabot balığı	variété de carpe de grande taille	variety of large carp
behram, sergolîk, qafgolîk, faran (bi zazakî). Serî û pelikên wî mezin in. dibin cewr, goştê wî spî ye û zaf xweş e	<i>squalius cephalus syn: leuciscus cephalus orientalis</i>	tatlı su kefalı	chevesne oriental à chair blanche et savoureuse	chub
berrade, birrek, zikdêlik, sîlikxwir: di çemê Mala Badê, çemê Goksuyê (çiyayê Mazî) de heye.	<i>cobitis kellei</i>	taşyiyenbalığı	variété de loche	loach
devsor, bizir: di çemê Dicleyê û hemû şaxên wê de hene	<i>carasobarbus luteus</i>	karazgöz, pullu sazan	variété de carpe à bouche rouge	kind of carp
şelabela: bi simbêl e.	<i>silurus triostegus</i>	Mezopotamya yayın balığı	silure	silurid
zurî, zul: di çemê Dicleyê û hemû şaxên wê de hene.	<i>chondrostoma regium</i>	kababurun	variété de chondrostome	kind of chondrostoma
benî (pasûr), şoneke (Mala Badê): di çemê Dicle û hemû şaxên wê de hene.	<i>cyprinion macrostomus</i>	benekli sazan	carpe tachetée	speckled carp
marmasî	<i>mastacembelus</i>	yılanbalığı	anguille	eel
masîpank	<i>cyprinus carpio</i>	aynalı sazan	carpe miroir	mirror carp



Beneksor
Salmo tigris



Deqsor, masixatûnk, sorbelek
Salmo trutta macrostigma



Masîgur
Aspius vorax



Terix: masiyê gola wanê
Alburnus tarichi



Şinok
Alburnus mossulensis



Şebot, şabot, şebût
Barbus lacerta



Sirink: sering, siring, sêlêv
Luciobarbus capito



Cer, cero
Luciobarbus esocinus / Luciobarbus xantopterus



Zereke, zerdemasî, pîrpaş (Mala Badê), sîraz
Capoeta capoeta umbla



Berat, çepîç
Capoeta trutta



Şebotê bersor (soreke)
Barbus (tor) grypus



Behram, sergolîk, qafgolîk, faran
Squalius cephalus, syn: leuciscus cephalus orientalis



Berrade, birrek, zikdêlik, silikxwir
Cobitis kellei



Devzor, bizir
Carasobarbus luteus



Şelabela
Silurus triostegus



Zurî, zul
Chondrostoma regium



Benî (Pasûr), şoneke (Mala Badê)
Cyprinion macrostomus



Marmasî
Mastacembelus



Masîpank
Cyprinus carpio

Termsaziya pizişkî bi kurdî

Termzanist

Berî ku derbazî pêşkêşkirina çend termekên pizişkî bibim, dixwazim ku bi kurtî behsa hin-dek binemayên termesaziya zanistî bikim.

Dibê bihêr zanîn ku termesaziya zanistî ya her zanistekê pişkek ji wê zanistê bi xwe ye. Bi gotineke dî, ku raman, têgeh û çem (çemik, konsept)ên nû di zanistan de peyda dibin, danûstandina li ser wan çemikan bê hebûna termê anko navên nû ji bo wan çênabin. Ji bo mînak kesê ku nezane mîh û bizin ne yek in, nikare ji du navên cida li wan lawiran bike. Dibê li destpêkê mirov bi cîdatî û newekheviya bûyeran, bûneweran, hestan û konseptan bihese, paşî dê ji bo wan navan peyda bike.

Ku kurdan çemên zanistî nebûne, term û navên wan çeman jî nebûne. Niha ku kurd bi xêra zimanên dî şehrezayên wan çem û konseptan dibin, dibê ji bo parastina paşeroja zimanê xwe bikin ku wan konsept û navan kediyên zozanê zimanê xwe bikin. Zimanê ku nebe zimanê zanistan ber bi nemanê ve diçe, bila meşîna ber bi nemanê ne ewqasî lezgîn ji be. Ez li ser vê mijarê gelek sekinîme û ji bo neêşandina sere we, wan gotinên xwe dubare nakim. Lê, di her termesaziyeke zanistî de, pêşkevîna zanistî bi xwe û pêşkevîna termesaziyeke bi hev re û mil bi milê hev in. Arêşeya termesaziyeke, wekî arêşeyeke pir tengasî, tenê ji bo wan zimanên mîna kurdî ye ku jîngeha zimanî ne jîngeheke zanistî ye. Anko, axivtinkerên wî zimanî bi xwe zanistê berhem nainin û tenê zanista berhemê xelkê dî dimezêxin.

Herwekî me got, zanist û zarevesaziya wê mil bi milê hev pêş dikevin. Çawa ku zanist li goreyê hindek pîrensîb û binemayan dihen ava kirin, zareveyên wan jî li goreyê hindek bine-mayên mîşlaq û hevî dihen ava kirin. Çawa ku konseptên nû, dahînan û nûkirinên nû di

zanistan de piraniya caran hema ji nebûnê nahên û avahiya zanistî kerpûç li ser kerpûçî û kuçik li ser kuçikî hêdî hêdî dihet nijîn, term ji weha yek li ser ya dî dihet ava kirin û ji bo her termeke nû ne hewce ye ku teker û çerx ji nû bihêr dahînan.

Ji bo mînak, dema amûreke nû ji bo pizişkan dihet dahînan ku dikarin bi wê amûrê endamên hundirîn yê laşî bibînin, û navê wê dikin *hinavbîn* (endoscope), êdî navên guhar-toyên taybetî yê wê amûrê çawa li goreyê hewcedariya çêdibin, wesa ji navên wan peyda dibin: *gedebîn* (gastroscope), *bendbîn* (arthroscope), *mîzdanbîn* (cystoscope), *zikbîn* (laparoscope), ... Kiryara dîtina wan endaman bi wan amûran jî dibit: *hinavbînî* (endoscopy), *gedebînî* (gastroscoy), ...

Tenê dibê nehêr ji bîr kirin ku dibê term li goreyê konsept û têgehiştinên zanistî bi xwe bin. Ku term ne di cihê xwe de bin an şêlû û ne zelal bin, dê şaşiyên zanistî bi dû xwe re biînin û rastvekirina wan şaşiyên dem û wizeyê herduan xusar dike.

Mînakekê bidim. Li Başurê Kurdistanê, di dibistanên soranî de, ji bo peyva "thermometer" a inglîzî peyva "germapêw"-ê hat bi kar anîn. Bi dîtina min ev peyiv şaş e, û dê mejî û hişê zaroyên ku bi wê peyivê dihen perwerde kirin tevlihev bike. Çima?

Di fîzîkê de du çem anko konsept hene ku ji hev cida ne: yek "heat" e ku coreyek ji coreyên enerjî anko wizeyê ye. Ya dî, "temperature" e ku navincîna bezayî anko sur'et (velocity) ya molekul in anko atomên keristeyekê ye. Ji bo baştir têgehiştina ji van herdu çeman dê zêdetir ruhînk bikim.

"Heat" anko enerjîya germayî ya ava gola Wanê ji enerjîya germayî ya peyaleyê çayê ku aveke sed dereceyî tê de ye zêdetir e. Lê

"temperature" anko navincîna bezayî ya molekulên ava peyaleyê sed dereceyî ji temperature anko navincîna bezayî ya molekulên avê yê gola Wanê zêdetir e.

Di kurmanciyê de, hindî ku ez dizanim, peyva "şîrtêhn - şîrtîn" an "têhnşîr - tînşîr" heye. Ramanê wê ew e ku têhna wî/wê wekî ya şîrê memikên dayikê anko laşê mirovî ye û devê mirovî an destê mirovî naşewitîne. Dema sope an tiştekê gelek sincirî anko gerim hebe, dibêjin gelek bi têhn e, anko têhn jê diçe, mirov nikare lê nêzik bibe an destê xwe li wê bide. Wekî ez dibînim, têhn beranberî temperature a inglîzî ye ne germa. Lewa, thermometer ku temperature dipêve, dibê bi kurdi bibe "têhnêpîv - tîn-pîv", ne *germapîv*.

Dema zaro bi şaşî bihêr fêrkirin ku thermometer germapîv e, wî çaxî dê konseptên di hişê wî de tevlihev bibin, nemaze dema ku zêdetir hînî fîzîkê û wan konseptan bibe. Çareserîya vê ew e ku ji destpêkê koma hemî konsept û çemên wekhev û nîzîkî hev û dijberî hev li ber çavan bihên girtin û paşî termên nû li goreyê wan bihên hîlbijartin an çekirin.

Di termên zanistî de, hindek tiştên pergala nî anko sistematîk hene. Ji bo mînak, di kîmyaya endamanî de, hindek pêşgir û paşgir li navgir hene ku hema bi qasî keriste û materiyalên kîmyayî destkirî ne. Dema alkuholeke nû bihêr dîtî an çekirin, li paşîya navê wê dibê paşgira "-ol", ku ji alkuholê hatiye, hebe: *methanol*, *ethanol*, *propranol*, ... ji bo piraniya malbatên keristeyên kîmyayî nav bi vî rengî li goreyê hindek "lihevhatin" di navbera zanayên wan zanistan de dihen çekirin. Dema keristeyekê nû dihet dîtî, êdî nav ji sifrê an ji nebûnê nahên çekirin. Avahiya zanistî kuçik bi kuçik, ber li ser berî, dihet nijîn. Kes avahiya berê xapîr û wêran nake. Hûner ne xerabkirin e, hûner avakirin e.

Di termesaziya zanistî de, dema çem an konsepteka nû ya giştîgîr û gelemperî peyda dibe,

Amadekar: Lezgînê ÇALÎ

terma wê çemê jî bi wî rengî giştîgîr û gelem-perî dihet danan. Ji bo mînak, dema di jîn-zanistî anko biyolojiyê de behsa diyardeyeke jînzanistî ya wekî avîsbûnê dikin, êdî avîsiya mişkekê, çêlekê, jinekê, û şajînekê yek e. Term her ew term e. Lê, di civatên ne zanistî de, mîna kurdan, çêl avîs dibin, lê jin ducan, dugiyan, şîrr, bi-hemil, ... Kurd dikarin niha jî di meclisên mirovên maqûl de, li malê, wekî berê bikin. Lê, mixabin di termên zanistî de jî hêştê ev edet ber nedaye.

Termên zanistî yê herî baş ew in ku "bizên" anko em bikarin termên nû ji wan çêbikin. Di vî warî de, bi dîtina min ev saloxetan gelek ji sî-vîkî û kurtiya terman giringtir e. Ji bo mînak, peyveke zanistî heye ku ji bo wan molekul an atomên keristeyan dihet bi kar anîn ku elektronek an çend elektronekên kêr an zêde hebin. Atomeke sodiyumê sanahîr elektronekê dide atomeke klorê û xwê ya ku em dixwin ji têk-hîlbûna wan herduan çêdibe. Atomên weha bi inglîzî "ion" in. Bi kurdi ji mirov dikare ji wan re her vî navî bixebitîne. Lê, peyveke dî ya inglîzî ji ion-ê zaye, ew jî *ionization* e. Kurdan (tîrk û farisan jî) wekî peyva ion-ê ev peyva duyê ji wergirtiye. Bi vî rengî dawîya wergirtina peyvên ji zimnaên biyanî nahêr û li dawiyê tenê de hindek daçek û artiklên biçûk ji zimanê me bimînin. Bi dîtina min, dibê ion çawa ku di zimanê inglîzî de dizêr, wesa jî di kurdî de bizêr û li şûna peyva ionizationê ji bo me kurdan du zaroyên bi navên ayonandin û ayonîn-ê biîne. Wî çaxî peyva *ionized* a inglîzî jî de xwîşkeke kurdi a bi navê *ayonandî*-yê hebe. Ev saloxeta peyvên zanistî giringtirîn saloxeta termesaziyeke zanistî ye. Ji ber çend sedeman: peyvên ji bo çemên nêzî hev ji nêzîkiya deng û rengên peyvên wan çeman jî dihen niyasîn. Gramer û rêzimana zimanê kurdi namirê û bi berdewamî di warê avakirina peyvên de di xebatê de dimîne. Kurd dizanin ku zimanê wan jî çalak û zindî ye û psîkolojiya wan jî xort dibe, bawerîya wan bi xwe û şîyanên zimanê wan xorttir dibe...

Termzanistê Pizişkî

Berî rêzkirina hindek peyvên zanistî ji bo pizîşkiyê, dikim ku hindek paşgir û pêşgirên pêdivî ji bo hemî zanistên nûdem bibêjim.

Hindek paşgirên pêdivî

-Kulî: Yek ji paşgirên gelek pêdivî di termzaniya pizişkî de paşgirek e ku ji bo navkirina nesaxiyên hewdanên endamên laşî dihêt bi kar anîn. Ev paşgir di zimanê inglîzî de wekî *“aytis”* dihêt bilêvkirin, di zimanê fransî û almanî de wekî *“it”*, lê nivîsîna wê di wan zimanan de yek e. Her yek li goreyê xwe bi lêv dike: *pneumonitis, nephritis, arthritis, meningitis, otitis, congenitivitis,...*

Di kurdîyê da, mirov dikare paşgira *“kulî”*-yê li şûna wê bixebitîne: *memikkulî (mastitis), pişikkulî (pneumonitis), kezebkulî (hepatitis), dilkulî (carditis), lenfkulî ()...*

-Bîn û -bînî: Du ji paşgirên dî yên ku di pizîşkiyê de gelek dihên xebitandin *“-scopy”* û *“-scope”* in. Min li jorê behsa wan kir.

-Kelêşî: Paşgireka dî *“-tomy”* ye. Ramana wê *“birrîn”, “şeqkirin”, “kelaştin”* e. Di kurdîyê de mirov dikare *“-kelêşî”*-yê li şûna wê bixebitîne: *laşkelêşî (anatomy), perdekelêşî (fasciotomy),...*

-Jêkirin: Paşgireka nêzikî ji ya berê *“-ectomy”* ye. Ramana wê jêkirin an havêtin e. Di kurdîyê de, mirov dikare *“-jêkirin”*-ê bixebitîne: *gurçîkjêkirin/gulçîsikjêkirin (nephrectomy), mîzdanjêkirin (cystectomy), libjêkirin (lobectomy),...*

-Derkelêşî: Paşgira sêyê ji vê rêzê, *“-ostomy”* ye ku ji bo kumkirina endaman û danan

boriyan di nav wan de dihêt xebitandin. Dibe ku kurdîya wê tişteke wekî *“-derkelêşî”*-yê be: *gurçîkderkelêşî (nephrostomy), kolonderkelêşî (colonostomy),...*

-Kêşî: Paşgireka nêzikî vê, *“-centesis”* e. Ramana wê valakirin an av jê keşan e. Kurdîya wê dikare bibe *“-kêşî”: sîngkêşî (thoracocentesis), bendkêşî/gehkêşî (arthrocentesis), zikkêşî (paracentesis),...*

-Dirûn: Paşgira bervajiyê van tevan *“-rhaply”* ye. Kurdîya wê dikare *“-dirûn”* be: *fitiqdirûn (herniorrhaphy).*

-Nîgar û -nîgarî: Du paşgirên dî *“gram”* û *“-graph”* in ku di peyvên ne-pizişkî yên mîna telegram û telegraph-ê de ji hatine xebitandin. *“-gram”* nîgar anko nivîsa berhema pêvajoya *“-graph”* ê ye. Di kurdîyê de, bi dîtina min, *“-nîgar”* ji bo berhemê, û *“-nîgarî”* ji bo pêvajoyê di cihê xwe de ne: *memnîgar/memnîgarî (mammogram/mammography), tînîgar/tînîgarî (radiogram/radiography),...*

-Pîv û -pîvî: Du paşgirên dî *“-meter”* û *“-metry”* in. *“-meter”* alav an amûra pîvanê ye û *“-metry”* pêvajoya pîvanê. Bi kurdi mirov dikare, bi rêz, *“-pîv”* û *“-pîvî”*-yê bixebitîne: *têhnpîv (amûrê pîvana têhnê: thermometer), têhnpîvî (pêvajo anko kiryara pîvana têhnê: thermometry)...*

-Andin û -în: Du paşgirên herî giring di pizişkiyê (û di hemî zanistên dî de) paşgirên çekirina lêkeran in. Ji bo çekirina lêkeran *“-ize”,* û *“-fy”* dihên xebitandin. Ji bo mînak dema keristeyek bibe ayon (*ion*) dibêjin ew keriste *“ayonîze bûye”,* dema keristeyek

bibe wekî sabûnê *“sabonîfike bûye”*. Bi kurdi, mirov dikare *“-andin”* û *“-în”* ê bixebitîne. Ji bo mînak ayonandin (*awayê gerguhêz*) û ayonîn (*awayê negerguhêz*) ji bo *ionîze*-ê di cihê xwe de ne: *sabonîn/sabonandin (saponify), tevizandin (anesthetize), ruxguherandin (modify), karevandin (electrify), gloverîn/gloverandin (globalize), nûjenandin/nûjenîn (modernize),...*

Hindek pêşgirên pêdivî

Gir- û hûr-: *“Macro-”* û *“micro-”*, bi kurdi piraniya caran mirov dikare, bi rêz, li şûna wan *“gir-”* û *“hûr-”*ê bixebitîne: *girpêl (macrowave), hûrpêl (microwave), giraborî (macroeconomy), hûraborî (microeconomy), girkiloxî (macrocephaly), hûrkiloxî (microcephaly),...*

Kêm- û pir-: Du pêşgirên dî hene, *“hypo-”* û *“hyper-”*. Bi kurdi mirov dikare li şûna wan *kêm-* û *pir-ê* bixebitîne. *Kêmpestî (hypotension), pirpestî (hypertension), kêmçalak (hypoactive), pirçalak (hyperactive), kêmalbumînî (hypalbuminemia), pîralbumînî (hyperalbuminemia), kêmşekirxwînî (hypoglycemia), pîrşekirxwînî (hyperglycemia),...*

Zir-: Yek ji pêşgirên bi kêr ku di gelek zanistan de heye. Kurdîya wê dikare *zir- be*. Wekî, *zirnav (pseudonym), zirzanist (pseudo-science), ziravisî (pseudopregnancy),...*

Nav- û (hin)dur-: Ev ji du pêşgirên giring in. *“Inter-”* behsa tişt an tiştên navbera du an çend tiştên dî dike. Wekî *“international”* ku heta niha di kurdîyê de wekî *navneteweyî* hatiye paçivandin. Pêşgireka dî,

“intra-” ye ku behsa tişt an tiştên nava anko hundirê tişteki bi tenê dike. Wekî *“intra-abdominal”,* anko hundirê zikî. Mîna keke dî. Gava mirov behsa têkhiyên çend kultur û ferhengan bike dê terma *“intercultural”*-ê bixebitîne (bi kurdi: *navferhengî, navkulturfî*), lê gava behsa têkhiya pêkhate û keriyên cida-cida yên nava ferhenhengekê bi xwe bikî wî çaxî dibêjin *“intracultural”* (bi kurdi: *durferhengî an hundurferhengî*). Mînakên dî: *navdepmilanî (interscapular), navkesanî (interpersonal), hundur/durxaneyî (intracellular), navxaneyî (intercellular), hundur/durzikî (intraabdominal),...*

Jêr-, jor-, ser-, bin-: Pêşgira *“infra-”* û *“sub-”* ji bo diyarkirina cihê tişteki ku nizimtir ji yê dî be dihêt bi kar anîn. *“Infrared”* pêleke ruhniyê ye ku li bin pêla sor e (jêrsor). *“Submarine”* gemiyek e di bin astê deryayê de dimeşe (jêravgemî). *“Ultra-”* û *“supra-”* ji bo cihê bilindtir in: *“ultraviolet”* ji bo pêla jortir ji pêla binefêş e (jorbinefêş), *“suprarenal”* gumtilekê li ser gurçikê ye (jorgurçîk).

Dî-, ber-: Pêşgireka dî heye ku di gelek zanistan de dihêt xebitandin û ji bo diyarkirina ramanekê nêzikî ramanekê di an cihekî an tişteki dihêt ku ne bi tivavî wekî ya dî ye. Peyva *“metacarpal”* ew hestî ne ku dikevin navbera zenda destî û tivilan (berzend). *“Metamorphosis”* pêvajoya guhartinê bo kelwaş anko morfeke dî ye (dîkelwaşîn). *“Metaplasia”*: pêvajoya werara xaneyên laşî ber bi aliyeke dî ku ne aliye xweriskî yê werara wan e, mîna seretan anko şêrpenceyê (dîgeşî).

Ferhenga pezxwedîkirinê

Amadekar: Eyûb Sînan KIRAN

Destpêk

Li gora îstatistikên demên dawî li bakurê Kurdistanê nêzikî 30.000.000î pez hene. Bi texmînî, li hemû welat nêzikî 50.000.000î pez tene xwedî kirin.

Goşt û qatixê ji şîrê pez ji bo xwarina însên, hiriya pez ji bo teksîlê gelekî muhîm e. Ji çermê pez jî rind tê istifade kirin. Lewma pezxwedîkirin karûbarekî bingehîn e. Ji xwe li gora xebatên arkeolojîk pez di dema neolîtîk de, belkî 10 000 sal berî nika li Herêma Hîvîka Bixêrûbêr (Fertile Crescent) ji formên biyanî hatiye kedi kirin û niha jî li vê herêmê hîn formên bejî hene.

Ji kedîkirinê û bi vir de, pratîka li ser karûbarê pezxwedîkirinê pir pêşde çûye. Di civata kurdî de, ji bo vê pêşdeçûna karûbarê pezxwedîkirinê termînolojiyêke dewlemend heye. Di vê gotarê de em ê vê termînolojiyê pêşkêş bikim. Ev termên pezxwedîkirinê bi taybetî ji herêma Milan e, ango ji Qerejdaxê hatiye berhev kirin.

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
alênc kirin	koyun sürüsünü dinlendirdikten sonra otlatmak (Karacadağ ve Mardin ovasında sadece öğlen sonrası için denir)	emmener le troupeau au paturage, pour le faire paître (terme utilisé à Karacadağ dans la région de Mardin seulement pour le pâturage de l’après-midi)	to graze the flock (of sheep) after rest (the term used in Karacadağ and Mardin, only for the afternoon grazing)
alif	1. yem, 2. yemlik	1. fourrage ; 2. alimentation, manger, aliments pour bétail	1. fodder, forage, feed (for livestock), feedstuff; 2. feeding-trough, manger, feeder.
afir	yemlik	mangeoir, dispositif d’alimentation pour le bétail	feeding-trough, manger, feeder for livestock.
alifandin, alif dayîn	yem vermek	donner du fourrage (au bétail). nourrir le bétail, distribution du fourrage au bétail	to give feed (to livestock).
xwêdank	tuzluk	1. salière ; 2. endroit où l’on dispose du sel pour le bétail.	salt lick
kulavê şivanan	kepenek	manteau de feutre de berger	shepherd’s (felt) cloak
berçovk, berşivk	kepenekte sopanın konulduğu yer	poche du manteau de feutre pour le bâton du berger	in the shepherd’s (felt) cloak, the part holding his stick
pezband, derzbend	çoban uyurken koyunların kaçışı esnasında uyanmak için eli ile koyunun boyuna bağlanan bağ	corde liant un mouton ou une chèvre à la main du berger, pour l’alerter si elle cherche à s’éloigner.	shepherd’s (felt) cloak
ço, çov, çûv, çomax	değenek	bâton	stick
mişrak	uzun sopa	long bâton	long stick
şiv	ince uzun değenek	bâton long et fin, baguette	thin and long stick
şiva gopal, gopalê şivanan	çoban bastonu	bâton du berger à l’extrémité recourbée	shepherd’s crook,
elb	gerdel	seau (en bois), bac	pail, bucket (made of wood)
bêriya yekdanî	koyunların günde bir kez sağılması	une traite par jour	once-a-day milking
bêriya dudanî	koyunların günde iki kez sağılması	deux traites par jour	twice-a-day milking
meşka şîr, eyarşîr, şîrar	süt tulumu	outre à lait en peau de bête tannée	milk container made of animal skin
avrênc	yayılacak kadar olmayan yoğurdun konulduğu tulum	outre de yaourt qui n’est pas assez pour être barratté	container for partly curddled yoghurt
sêpiya meşkê	yayık yayma sehpaşı	trépied (auquel on suspend la baratte ‘meşk’ pour la secouer)	tripod on which to hand churner
meşka dew	ayran tulumu	baratte (en peau de génisse ou de chèvre, parfois en terre, suspendue à un trépied, dans laquelle on baratte le yaourt pour en extraire le beurre)	container made of foal ot goat skin to hold liquid yogurt while churning to make butter

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d’information

© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, www.fikp.org

Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN, S. ILITCH, Y. KARADEMIR